hejmar 14-15 zivistan - havîn 1994

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Parîsê

Civîna payize di navbera rojên 29 teşrîn-5 kanûn 1993yan de, li Parîsê, pêk hat. Tiştê vê civînê yê hêjayî gotinê ew e ku civîn di dema lidarketina konferanseke navneteweyî de, ku di bin navê «Zimanê kurdî ber bi sala 2000 î» de, ji aliyê Enstîtuya Neteweyî ya Ziman û Bajarvaniyên Rojhilatê û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ve hatibû amade kirin. Ji çaraliyên cihanê, kesên kurd û biyanî, wek pispor yan jî wek mêvan ji bo vê konferansê ku di avahiyeke xweser û kevnare ya zanîngeha Sorbonê de pêk dihat, hatibûn vexwandin.

Mebesta vê konferansa navneteweyî, bi kurtî, ew bû ku rewşa zimanê kurdî ya îro, gehînek û qonaxên ku ew di vê sedsala dawîn de jê derbas bûyî û tecrubeyên jê derketî, raxîne ber çavan û wan binirxîne. Herweha wî bide ber çend zimanên din, ku di dîroka xwe de rastî gelek asteng û boblatan bûne ku dişibîne yên zimanê me, nirxandin û bêjîngkirina encamên wan û hwd.

Herçî bend û raporên pisporan, gotar û axaftinên vexwandî û mêvanan in, ku pêşkêşî konferansê kirine, dê piştre wek pirtûkekê bi çend zimanan bête weşandin.

Beşdarên civînê, di wan çend rojên mayî de, li ser xalên programa xwe xebitîn. Ji bo civîna bihara 1994an bernameyek danîn. Hevalên ku beşdarî vê civînê bûbûn ev in : Khosrow Abdollahî (Selmas), Elîşêr (Wan), Lutfî Baksî (Xerzan), Ordixanê Celîl (St.Petersbûrg), Rojan Hazim (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Zinar Soran (Dêrik), Têmûrê Xelîl (Rewan), Reşo Zîlan (Agirî) û Zeynelabidîn Zinar (Batman).

Civîna bihara 1994an


Civîna panzdehemîn ya li ser zimanê kurdî, zaravayê kurmancî, di navbera rojên 3-8ê nîsana 1994an de li Swêdê, di xwendegeha Biskops Arnöyê de pêk hat.

Bernameya vê civînê, ji gotûbêjên li ser hin pirsgirêkên rastnivîsînê, ferhenga pehlewî, devoka Hekariyan, navdêr û lêkerên ji dengan diafirin, peyvên di kovarên Ronahî û Roja Nû de û herweha ferhengokên hin klasîkên me pêk hatibû. Civînê, herwekû caran, kar û barên xwe nirxand û ji bo civîna pêşî jî bernameyek danî.

Em hin ji encamên vê civînê di vê hejmara Kurmancî de diweşînin.

Hevalên ku beşdarî vê civînê bûbûn ev in : Khosrow Abdollahî (Selmas), Elîşêr (Wan), Lutfî Baksî (Xerzan), Rojan Hazim (Hekarî), Hemîd Kiliçaslan (Mêrdîn), Derwêş Ferho (Mêrdîn), Mehmûd Lewendî (Qerejdax), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Dêrik), Rojen Barnas (Diyarbekir), Reşo Zîlan (Agirî) û Zeynelabidîn Zinar (Batman).

ristin



Amadekar : Zinar SORAN

kurdî	**tirkî**	**fransîzî**	**îngilîzî**
ristin, rêsîn	eğirmek, iğmek	filer la laine	to spin
teşî	iğ, örek	fuseau	spindle
teşîrêsî	eğirme, iğme (iğ ile)	filage avec un fuseau	spinning
teşî ristin/rêsîn	öreke (iğ) ile eğirmek	filer avec un fuseau	to spin
serteşî	iğ başı, örekebaşı	la tête du fuseau	head of the spindle
doxteşî, dûlkê teşiyê	iğ sapı, örekesapı	la tige du fuseau	spindle's stem
nîk, nêk, nihk, nik, nûk	iğ tığı, öreke tığı	pointe métallique du fuseau	spindle's needle
zî	ince iplik	fil fin	thin yarn
rîş	yün ipliği	fil de laine	yarn
peng	yumak yapılırken çaprazlamasına atılan bağlar	nœud croisé de la pelote	crosswise knot in a wood ball
guloka dupengî	çifte bağlı yumak	pelote à deux nœuds	wood ball with double knots

guloka çarpengî	dört bağlı yumak	pelote à quatre nœuds	wood ball with four knots
peng, kelef, penge	çile	écheveau	hank
ta, dezî	iplik	fil	thread, yarn
tayê xav, tayê kêmba	iyice eğrilmemiş iplik	fil mal formé	ill spinned yarn
ben, benik, bend	ip	corde	rope, cord, string
nex, nexik	kıl iplik	fil en poils de chèvre	hair made thread
arşûjin, asûjin, arşûn, aşûjin	çuvaldız	grosse aiguille pour sacs à grains	packing needle
sênex	kalınca kıl ip	ficelle en poils de chèvre	string made of goat's hair
qinap, qirnap	kınnap	fil en chanvre	hemp thread
kap	kalın ip	ficelle	string, twine
werîs	urgan	grosse corde en poils de chèvre	stout rope made of goat's hair
şirît	şerit	corde en chanvre	hemp rope
teng, tang	enli yassı urgan	bande tissée en poils de chèvre	strip made of goat's hair
bisk	yün saçağı	frange de laine brute	fringe of untreated wool
kulî, sîmek	taraktan geçirilmiş eğrirmeye hazır yün tutamı	flocon de laine peignée	pinch of combed wool
lûfik, lûlik	eğirmeye hazır uzunlamasına dolanmış yün yumağı	mèche de laine peignée	tuft of combed wood
şeh, şehhirî, şe	yün tarağı	peigne à laine	card
şehmû, şehê mû	kıl tarağı	peigne à poils	comb
devşeh	bir defada yün tarağı ağzına gelebilecek miktarda yün destesi	quantité de laine brute qui pourrait être passée au peigne en une fois	quantity of untreated wool that can be carded in one go
hirîşo	1) yün yıkama günü, 2) yün yıkayan	1) jour du lavage de la laine, 2) laveur, se de laine	1) wool washing day 2) wool washer
hirî raxistin	yünü kurutmak için sermek	étendre la laine pour la sécher	to spread out wool to let it dry
veçirandin	taraklama öncesi yolarak ayıklamak	triage de la laine brute avant le peignage	sorting out wool before carding
şeh (şe) kirin	taramak	peigner	to card
berkabik, berrank	eğirmede kullanılan deri veya muşambadan yapılan diz önlüğü	protège-jambe en cuir ou toile cirée utilisé par les fileuses	leather shin guard
teşî vizandin	iğ çevirmek	tourner fuseau	to roll the spindle
teşî zîz kirin	iği hızlandırarak döndürmek	faire tourner vite le fuseau	to turn the spindle quickly
teşî badan	iğ çevirmek	tourner fuseau	to roll the spindle
ziyîn	ipi makaraya/yumağa sarmak	embobiner	to wind
binşeh, binşe	tarak artığı yün	rebut du peignage	carding left-ouers
serşeh, serşe	taraklanmış ilk yün	laine peignée de premier choix	top-quality carded wool
mû	kıl	poils	hair
hirî	yün	laine	wool
liva	kuzu yünü	laine d'agneau	lamb's lab's wool
tiftîk, çûr	tiftik	mohair	mohair
kej	bir çeşit keçi kılı	sorte de poils de chèvre	kind of goat's hair

FERHENGOKA
Pehlewî û Kurmancî

Amadekar : Rojen BARNAS

Pehlewî, Farisiya navîn e. Farisiya kevin yek ji zimanê resmî yê dewletê yê dewra Axamenidan bû ku ji dema Darius (çi bigre berî Îsa 500î) heta dema zefta Îranê ya Îskenderê Makedonî ajot (berî Îsa 330-327). Di dema Axamenîdan (Akamenid) de Farisî, Êlamî û Akadî zimanên resmî û Aramî jî zimanê dîplomasî û bazirganî yên împaratoriya Persan bûn.(1)

Bi vegirtina Îranê ya Îskender re Farisiya kevin ji zimanê resmî yê dewlet-bûyinê derket û cihê xwe ji zimanê resmî yê împaratoriya Îskender, ji Yûnanî re hişt.

Di nîveka sedsala 200î berî Îsa Parthên koçer ku li bakurê Îranê bûn, ji rojhelat û bakur ve heta Babîl û Êlamê Îranê dan ber xwe û kirin bin hukmê xwe, ku di wê demê de ev dever di bin hukmê Seleukiyan de bûn û zimanê wan ê burokrasiyê Yûnanî bû. Di destpêkê de Parth zimanê xwe di danûstandinên resmî de bikar neanîn, di dewsê de Yûnanî wek zimanê resmî bi kar anîn.

Parthî di destpêkê de zaravayekî îraniyê bakurîn bû ku nêzîkî Skîtî û Sakayî bû û jê re Pehlewî an Farisiya navîn jî tê gotin. Di zemanê Sasaniyan de (piştî Îsa 224-641) û bi taybetî di dema Narseh de (293 - 302) Parthî an Pehlewî bû zimanê resmî yê dewletê. Bi têkçûna hukumraniya Îranê li hember îstilayên Îslamê, Pehlewî an Farisiya navîn jiyana xwe temam kir. Di dewsê de Erebî wek zimanê dîn, bû zimanê resmî yê dewleta Îslamê û bêguman yê Îranê jî.

Di 822yan de Tahirê Samanî li Xoresanê têkiliya xwe ji xelîfê Bexdayê birî. Samanî ku xwe ji azbata Sasaniyan dihesibandin di koşk û serayên xwe de şair û nivîskar xwedî dikirin û Farisiya ku gel pê diaxifî wek zimanê edebiyatê pêşve birin. Ji vê Farisiya ha re Farisiya nû tê gotin.

Wek şaxekî ji dara zimanê Hîndû Ewropayî zimanê Îranî ji sê guliyan pêk tê:(2)

1) Îraniya bakur: Osetî, Skîtî, Sogdî û w.d
2) Îraniya rojhelat: Peştû (Efxanî) û Avestayiya kevin
3) Îraniya rojava: Farisî û Kurdî

Bi vê xebata ha me xwest dûrîtî û nêzîkiya bêjeyên di Kurmanciya me ya îroyîn û yên di Pehlewî de tesbît bikin. Ev xebata me li ser bingehê "Ferhenga Pehlewî-Îngîlîzî"(3) ya D.N.Mackenzie ye. Bêjeyên di vê ferhengê de ji Farisiya Navîn a Manîkî (dînê Manî) û Farisiya Nû ya herî zû pêk hatine. Transkripsiyon û maneya bêjeyan a bi Îngîlîzî yên Mackenzie ne. Me bi tenê bilêvkirina (telafûz) wan a bi Kurmancî (yên bêjeyên Pehlewî) û maneya wan a bi Kurmancî li berê danî.

Di vê xebatê de me ji bêjeyên sivik yanî yên di bilêvkirinê de çibigre mîna hev in dest pê kir û di civînên pêş me de jî hêdî hêdî ber bi yên girantir ve herin.

(1) *Bra Böckers Världs Historia*, cild 3, r. 93, Bokförlaget Bra Böcker, Höganäs, 1983.
(2) *Bra Böckers Lexikon*, cild 11, r. 381, Bokförlaget Bra Böcker, Höganäs, 1986.
(3) *A Concise Pahlavi Dictionary*, D.N.MACKEZIE, Oxford University Press, Ely House, London, W.r, 1971.

A

Transkrîpsiyona Pehlewî û xwendina wê	Kurmanciya îroyîn	Fransizî	Îngilîzî
a = e			
agar (eger)	eger, ger, heger	si	if
ambar [Er. ‘anbar] (‘ember)	ember (bihn)	ambre gris	amber gris
arzān (erzan)	erzan [≠]	cher	valuable, worthy
asmān (esman) [N: āsmān]	esman	ciel	sky, heavens
az (ez) [P]	ez	je	I
ā = a			
āfrīdan, āfrīn- (afrîden, afrîn-) [N: āfarīdan, āfarīn-] (aferîden, aferîn)	afirandin, afirîn-	louer, bénir, créer	praise, bless, create
āfrīn [N: āfarīn] (afrîn, aferîn)	aferîn, eferim	bénédiction, louange	praise, blessing
āgāh (agah)	agah	avisé, au fait	aware, knowing

ārd (ard)	ard, ar, arvan	farine	flour
āϑīh [N: āϑī] (aştîh, aştî)	aştî	paix	peace
āzād (azad)	azad, aza	noble, libre	nobble, free

B

b = b

bāγ (baẍ)	baẍ, baẍçe	jardin	garden, orchard
bahr (behr)	behr, par	part, portion, lot	part, portion, share, lot
bāj (bac)	bac	taxe, tribut	tribute, tax
bālēn [N: bālīn] (balên / balîn)	balîn, balişne, balîv, balgih	coussin, oreiller	cushion, pillov
bar (ber)	ber (meywe)	fruit, produit, profit	fruit, produce, profit
bār (bar)	bar	charge, fardeau, devoir	load, burden, duty
bārestān (baristan)	baristan	patient (patience), résigné	patient (patience), resigned
bārestānīh (baristanîh)	baristanî	patience, résignation	patience, resignation
baxt (bext)	bext	fortune, destin, sort	fortune, fate
bāz (baz)	baz	faucon	hawk, falcon
bē (bê / bî)	bê	sans	except, without
bēh (bêh / bih)	bih, biyok	coing	quince
bizeϑk [N: piziϑk] (bizişk)	bizîşk, bijîşk	médecin	doctor, physician
bōr (boor)	bor	roux, brun-rouge	reddish-brown, bay (horse)
brīn (brîn)	birîn	coupe, division, coupure	cut, division, delimination, limited
brinj [N:birinj] (brinc / birinc)	birinc	riz	rice
bryng [N:birinj] (brwîng, birinc)	birinc	bronze	bronze, brass

Ç

č = ç

čambar (çember)	çember	cercle, cerceau	circle, hoop
čand (çend)	çend	combien, tant	how many, much, so many
čang (çeng)	çeng [e.k.]	harpe	harp
čarm (çerm)	çerm	peau, cuir	skin, hide, leather
čaw(la)gān [N:čaugān] (çewlegan / çewgan)	çewgan, çogan	maillet de polo, polo	polo-stick, polo
činār (çinar)	çinar	platane oriental	oriental plane tree

D

d => d

dād (dad)	dad	loi, droit, justice; écrits portant sur des questions de droit	law, justice; those scriptures dealing with legal matters
daftar (defter)	defter	registre, livre de comptabilité	register, acount-book
-dān (-dan)	-dan, -dank	suffixe, qui contient	suffix, -holder, -container
dān(ag) [N: dāna] (dan/daneg/dane)	dan, dane, tene	semence, graine	seed, grain
dar (der)	der, derî	porte; palais, chapitre, sujet	door; palace; chapter, subject
dār (dar)	dar	arbre, potence, bois	tree, gallows; wood
-dār (-dar)	-dar	suffixe, qui contient	suffix, -holder, -keeper
darband (derbend)	derbend	porte, portail	gate

dard (derd)	derd	douleur	pain
dārēn (darên)	darîn	en bois	wooden
dargāh (dergah)	derge, dergah	porte, embrasure de porte	doorway
darmān (derman)	derman	remède, médicament	remedy, medicine
darz (derz)	derz	ourlet	seam
dās (das)	das	faucille	sickle
dast (dest)	dest	main	hand
dast-gir (destgîr)	destgîr, destgir	auxiliaire, captif	helper, captive
da∂t (deşt)	deşt	terrain découvert	plain, open, ground
deh (dih)	dih, dêh	paysage, terre, village	country, land, village
dēn [N: dîn] (dên / dîn)	dîn	religion	religion
dēnār [N: dīnār] (dênar / dînar)	dînar	dinar (or)	(gold) dinar
dēw (dêw)	dêw	démon, diable	demon, devil
dēwār (dêwar)	dîwar	mur	wall
dīdār (dîdar)	dīdar [e.k.]	vision, visible	sight, visible
dil (dil)	dil	coeur	heart
dilēr (dilêr)	dilêr	courageux	brave
diz (diz)	diz, dize, dêz, dêze	forteresse	fortress
dōst (doost / dûst)	dost	ami	friend
drust [N:durust] (drust / durust)	drust	droit, juste	right, just
dūr (dûr)	dûr	lointain, distant, éloigné	far, distant, remote

E

ēk [N: yak] (êk / yek)	êk, yek	un	one

F

framān [N:farmān] (freman / ferman)	ferman	ordre, instrument; péché mineur	order, command; a minor degree of sin
frayād [N : faryād] (freyad / feryad)	feryad [e.k.]	aide, assistance	help, assistance
frazēn [N: farzin] (frezên / ferzin)	ferzîn, ferezîn	(échecs) reine (lit. garde)	(chess) queen, (lit. 'guard')

G

gabr [N: gōr] (gebr, goor)	gor	tombe, fosse	hollow, cavity, tomb
gač (geç)	geç	plâtre, gypse	plaster, gypsum
gāh (gah)	-geh, -gah	place, lieu, siège	place, throne, bed
-gar (-ger)	-ger	suffixe, formant des noms d'artisans	suffix forming actor nouns
garān [N: girān] (geran / giran)	giran	lourd, sérieux, difficile	heavy, serious, difficult
gardan (gerden)	gerden	cou	neck
garm (germ)	germ	chaud	warm, hot
gaz (gez)	gez, gezik	tamaris	tamarisk
gil (gil)	gil, gil û gemar	argile, glaise	clay
giyā(h) (giya(h))	giya	herbe, herbage	grass
gōn [N: gūn] (goon / gûn)	gon, gûn, gwîn	couleur	colour
gō∂t (gooşt)	goşt	viande	meat, flesh
gul (gul)	gul	fleur, rose	flower, rose
gumān (guman)	guman	doute	doubt
gumbad (gumbed)	gumbed, kumbet, kumbez	dôme, coupole, temple du feu	dome, fire-temple
gyān [N: jān] (gyan / can)	giyan, can	âme, fantôme	soul, ghost

H

haft (heft)	heft	sept	seven
ham (hem)	hem	aussi, de même	also, same
hāmōn [N: hāmūn]	hamûn	niveau, plat	level, flat
(hamoon / hamûn)har(w)	her	tout, chaque	all, each, every
[N: har] (her(w) / her)			
ha∂t (heşt)	heşt	huit	eight
hunar (huner)	huner	vertu, aptitude	virtue, ability, skill
hunarōmand [N:hunarmand]	hunermend	apte, habile, vertueux	skilled, virtuous
(hunaroomend / hunermend)			

J

j = c

jādūg [N: jādū] (cadûg / cadû)	cadû, cazū	sorcière, magicienne	sorcerer, magician
jām (cam)	cam	verre, vitre	glass
jang (ceng)	ceng	combat, lutte, bataille	struggle, battle, fight
jār (car)	car	fois, occasion	time, occasion
jō(y) (coo(y))	co, cih	ruisseau, canal	stream, channel
judāg [N: judā] (cudag / cuda)	cuda, cihê	séparé, différent	separate, different
juwan [N:jawān] (cuwan / cewan)	ciwan	jeune, un(e) jeune	young, a youth

K

kaf (kef)	kef	écume, mousse, bave	foam, slime
kām (kam)	kam, qam	volonté, désir, but	will, desire, purpose
kanār (kenar)	kenar	côte, bord	side, edge; embrace
kār (kar)	kar	travail, action, affaire	work, deed, affair
kārewan [N: kārwān]	karwan	caravane,	caravan, military column
(kariwan / karwan		colonne militaire	
karr (kerr)	kerr	sourd	deaf
kas (kes)	kes	personne, quelqu'un	person, somebody
kāskēn (kaskên)	kesk, keskîn [≠]	bleu, lapis	lapis lazuli
ka∂tīg [N;ka∂tī] (keştîg, keştî)	keştî	bateau, navire	boat, ship
kē [N:kī] (kê, kî)	kî / kê	qui	who, which
kēn [N:kīn(a)] (kên / kîn(e))	kîn	haine, malice, revanche	hate, malice, revenge
kilēl [N: kilīd] (kilêl / kilîd)	kilîlik, kilîl, kilîd	clé, clef	key
kōr (koor)	kor	aveugle	blind
ko∂k (kooşk)	koşk	pavillon, palais, kiosk	pavilion, palace, kiosk
kū [N:kī] (kû, kî)	ku, ko	où, que	where, that, than
kulāf [N:kulāh] (kulaf / kulah	kulav, kulah	coiffe, bonnet	cap, bonnet

L

larzīdan, larz- (lerzîden, lerz-)	lerizîn, leriz-	trembler, frissonner	shiver, tremble
la∂kar (leşker)	leşker	armée	army

M

ma (me)	me (meke, meçe)	ne pas	not (prohibitive)
mār (mar)	mar	serpent	snake
mast (mest)	mest	hébété, intoxiqué	bemused, intoxicated
māst (mast)	mast	yaourt, lait caillé	curds, sour milk (?)
mā∂ (maş)	maş, maşik	vesce	vetch, pulse

maðk (meşk)	meşk	baratte en peau	mussuck, skin bag (for liquidds)
may (mey)	mey	vin	wine
mēwag [N:mēwa] (mêwe(g))	mêwe, meywe	fruit	fruit
mēx [P: myx] (mêx / mwîx)	mîx	clou, cheville	peg, nail
muhr (muhr)	mor, muhr	sceau	seal
N			
naft (neft)	neft	moite, humide, naphte	moist, damp, naphta
nān (nan)	nan	pain, nourriture	bread, food
nāzuk (nazuk)	nazik	tendre, gentil, inconstant	tender, gentle, fickle
nīð- (nîş-)	nîş, nîşandan	voir, observer	see, observe
nīðān [N: niðān] (nîşan / nişan)	nîşan	signe, marque, bannière	sign, mark, banner
niyāz (niyaz)	niyaz	besoin, manque, misère	need, want, misery
P			
pādēz [N:pāyēz] (padêz/payêz)	payîz	automne	autumn
pahn (pehn)	pehn, pan	large	wide, broad
pāk (pak)	pak	propre, pur, sacré	clean, pure, holy
panāh (penah)	penah	protecteur, refuge	protector, refuge
panīr (penîr)	penîr, penêr	fromage	cheese
pānzdah (panzdeh)	panzdeh	quinze	fifteen
parr (perr)	perr	aile, plume	feather, wing
payādag [N:piyāda] (peyadeg / piyade)	peya, piyade	à pied, pieton, fantassin	on foot, foot-solder, (chess) pawn
paywand (peywend)	peywend	liaison, connexion, progéniture	connection, offspring
pēð (pêş)	pêş	avant, auparavant	before
pēðag [N:pēða] (pêşeg, pêşe)	pêşe, pîşe, bêşe	commerce, métier,	trade, craft; guild, caste
pīr (pîr)	pîr	vieux, âgé, ancien	old, aged, ancient
pōst (poost)	post	peau, écorce; coquille	skin, hide; bark, shell
pōstēn (poostên)	postîn	(fait en) peau	(made of) skin
pōz(ag) [N:poz(a)] (pooz(eg) / poz(e))	poz	museau, gueule	snout, muzzle
puðt (puşt)	pişt	soutien, protection	back; support, protection
R			
rān (ran)	ran	cuisse	thigh
rang (reng)	reng	couleur, teinture	colour, dye
ranj (renc)	renc	labeur, ennui	toil, trouble
rāst (rast)	rast	vrai, droit, direct	true, straight, direct
raz (rez)	rez	vin, vignoble	vine, vineyard
razm (rezm)	rezm [e.k.]	bataille	battle
razmgāh (rezmgah)	rezmga, rezmgah	champ de bataille	battlefield
rēð (rêş)	rîş	plaie, blessure	wound, sore
S			
sad (sed)	sed	cent	hundred
sag (seg)	se, seg	chien	dog
sahm (sehm)	sehm, sehw, saw	terreur	terror
sāl (sal)	sal	an, année	year
-sālag [N: -sāla] (sale(g))	-sale (yeksale, sêsale...)	âgé de...	... -year old

sālār (salar)	salar [e.k.]	dirigeant, maître	leader, master
sāmān (saman)	saman [e.k] (=tehemul]	limite, frontière	limit, boundary
sar (ser)	ser	tête; sommet, cime, fin, commencement	head; top, summit; end, beginning
sarāsar (seraser)	seraser, seranser	du début à la fin, d'un bout à l'autre	from end to end
sargēn sergên)	sergîn	bouse, fumier	dung, manure
sarw (serw)	serw, selw, selwî	cyprès	cypress
saxt (sext)	sext	fort, dur ; sévère(ment), très	strong, hard, severe(ly); very
saxtag [N:saxtiyān] (sexteg /sextiyan)	sextiyan	maroquin	morocco leather
sāyag [N: sāya] (sayeg / saye)	sî, saye	ombre	shade, shadow
sēzdah (sêzdeh)	sêzdeh	treize	thirteen
sīh [N: sī] (sîh / sî)	sih, sî	trente	thirty
spās [N:sipās] (spas / sipas)	spas	service, gratitude, remerciement	service, gratitude, thanks
spās-dār (spasdar)	spasdar	reconnaissant	grateful, thankful
srōd [N: surōd (srood / surood)	srûd	chant, chanson	song
stūn(ag) [N: stūn] (stûn (eg))	stûn	colonne, pilier, mât	column, pillar, mast
sūd (sûd)	sûd	usage, emploi, profit,avantage	use, profit, advantage
sust (sust)	sist	lâche, insolent, mou, paresseux	slack, lazy

Ş

∂ād (şad)	şa, şad	heureux, joyeux	happy, joyful
∂āh (şah)	şah	roi	king
∂ahr (şehr)	şehr, şar, bajar	pays, ville	country, city
∂arm (şerm)	şerm	honte	shame
∂a∂ (şeş)	şeş	six	six
∂āzdah [N: ∂ānzdah] (şazdeh/şanzdeh)	şazdeh, şanzdeh	seize	sixteen
∂ēwan (şêwen)	şîn, şîwen	se lamenter	lament
∂iftālūg [N: ∂aftālū] (şiftalûg / şeftalû)	şeftalû	pêche	peach
∂īr (şîr)	şîr	lait	milk
∂īrēn [N: ∂īrīn] (şîrên / şîrîn)	şîrîn	doux, sucré	sweet

T

tā (ta)	ta, heta	de manière à, jusqu'à	until; so that
tambūr (tembûr)	tembûr	cithare, luth	cither, lute
tan (ten)	ten, beden	personne	nobody, person
tan-drust (tendrust)	tendrust	sain, entier	healthy, whole
tang (teng)	teng	étroit, serré	narrow, tight
tanuk (tenuk)	tenik	mince, superficiel	thin, shallow
tanûr (tenûr)	tenûr, tendûr	four	oven
tarr (terr)	terr	humide, frais	moist, fresh
ta∂t (teşt)	teşt	bol	bowl
taxt (text)	text	trône	throne

U

ummēd (ummêd)	umîd	espoir	hope
ummēdwār (ummêdwar)	umîdwar	plein d'espoir, prometteur	hopeful

W

warz [N: barz] (werz / berz)	werz	travail, labeur, agriculture	work, agriculture
wāy (way)	way !	malheur !	woe !

X

xāk (xak)	xak	terre, poussière	earth, dust
xām (xam)	xam, xav	cru, brut	crude, raw
xān (xan)	xan, xanî	maison	house
xēm (xêm)	xîm, hîm	nature, caractère	nature, character
xēəm [N: xiəm] (xêşm / xişm)	xişm	colère, courroux	anger, the demon Wrath
xōg [N: xōy] (xoog / xooy)	xû, xûy, xwî	nature, caractère	nature, character, disposition
xwah (xweh)	xweh, xwişk	soeur	sister

Y

yak (yek)	yek, êk	un(e)	one
yāzdah (yazdeh)	yazdeh, yanzdeh	onze	eleven

Z

zamān (zeman)	zeman	temps, heure	time, hour
zanjīr [P: zyncyhr] (zencîr / zwîncihr)	zencîr, zincîr	chaîne	chain
zayt (zeyt)	zeyt (≈)	olive	olive
zēn [Nû: zīn] (zên / zîn)	zîn	selle	saddle
zēndān [Nû: zindān] (zêndan/zindan)	zîndan	prison	prison
zēnhār [N: zinhār] (zênhar/zinhar)	zinhar	protection	protection
zīrak (zîrek)	zîrek, jîr	sage, intelligent	wise, clever
ziət (zişt)	zişt	haineux, laid	hateful, ugly
zōr (zoor)	zor	pouvoir, force	power, strength
zyān [Nû: ziyan (zyan / ziyan)	ziyan	perte, dommage	loss, harm, damage

---

ŞANEK :

[≈]	maneya gotinê ya kurmancî bi ya îngîlîzî re têkildar e, lê ne wek hev e.
[≠]	maneya gotinê ya kurmancî an bi ya îngîlîzî re dijmane ye an jî lê nanihêre.
[∫]	maneya gotinê ya kurmancî an bi ya pehlewî re dijmane ye an jî lê nanihêre
[e.k.]	di edebiyata klasîk de.
[N]	Farisiya Nû
[Er.]	Erebî
[P]	Parthî

DEVOKÊ HEKARÎYA

Rojan HAZIM

Devokê Hekarîya cihekî girîng û taybetî heye di dîyalekta kurmancî da... Ji ber vê çendê ye ku me li ser vi devoki dest bi lêkolîneke dirêj û fireh kir û ev karê me dom dike. Lê belê, li vê derê; ji bo xebata «*Kurmancî*» (Rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, li ser pirsên zaravê kurmancî), em dê di gel hinek nimûneyan û bi kurtî li ser vê çendê bisekinin...

Coxrafya devokê Hekarîya

Ev devoke li aqarekî mezin û fireh têtê axivtin. Ji bilî êl- eşîrên xwecih yên navça Hekarîya, bireke mezine van eşîran belavî aqarekî firehe dorberê Hekarîya jî bûne. Di bingeh da devokek jî be, lê herweha li gorî êl - eşîran gelek nuansên devokî jî peyda bûne. Nuansên sereke di devokê Hekarîya da ; Ertoşîyanî, Pinyanişî, ∑emdînanî, Oremarî, ∑ikakî, Elbakî, Amêdîyanî û Goyanî ne. Helbet ev nuanse jî di nav xwe de xwedî nuans in... Ji navça Gever, Mirgever û Tirgever bigrin heta alîyê ∑emdîna hindek êl-eşîrên wekî Dirî, Herkî, Gerdî, Begzade û Doskîya jî di nav devokê Hekarîya da nuansên bi serê xwe ne... Lê belê, di nav van nuansa da ji alîyê bi lêvkirinê ve Goyanî taybetîyeke xweser heye. Di gel taybetîya xwe; ji ber ku eşîra Goya li ser tixûbê Hekarî û Botan bi cih in, di bin tesîra devokê Botan da jî maye.

Ev nuansên devokê Hekarîya; ji Westan, Elbak, Qesrik, Şax û Miksa Wanê bigre heta pişta Silopî û li alîyê rojhilatê jî heta nêzîki Urmîye û pişta Şnoyê, li başûr jî; ji Kahnîmasî û gelîyê Berwarê, Amêdîyê û heta pişta Dihok û Zaxo têne axivtin... Helbet navenda vi devoki Colemêrg, Elkî, ∑ax, Elbak, Gever, ∑emdînan, Çel, û heta dereceyekê jî Qilaba ye...

Lê belê, serûkahnîya devokê Hekarîya Colemerg û Elkî ye... Navçên dî jî li dor vê kanê fireh dibin...

Helbet îro demografîya Hekarîya jî gelek hatîye guhartin. Bûyerên aborî, civakî, polîtîk û leşkerî bûyne sebebê koç û bareke navînî û derveyî... Gelek êl-eşîra, cih û warên bab û kalên xwe berdane û bar kirine çûyne cihên dî...

Nêzîkî nîv milonê kes di vê cografya fireh da bi vi devoki daxivin.

Devokê Hekarîya di alfabê da

Di alfaba ku Bedir Xanîyan danî da û bilêvkirina Hekarîya da nuansek heye: Dengê **û** wekî **ü** ya tirkî têt... Di axivtinê de şûna ku bêjin «**hûn**» dibêjin «**hün**»... Lê belê ev nuanse jî di timamî Hekarîya da bi kar nayêt. Li hind cihên Hekarîya herwekî «**hûn**» têtê gotin... Wekî me di serî da gotî; di devokê Hekarîya da jî hindek nuans hene...

Çend mînakên dî: **bûn** dibe **bün** / **kûr** dibe **kür** / **dûr** dibe **dür** / **bûk** dibe **bük**... Ev bilêvkirine li Behdîna û Botan jî wisa ye: Carina li hersê navçan «**û**» dibe «**î**». Wekî **bûn**/**bîn**, **dûr**/**dîr**, **kûr**/**kîr**, **bûk**/**bîk**... (bi taybetî li hêla Amêdîyê).

Dengê «**r**» bi taybetî di nîveka Colemêrgê û çarçoveyeke teng da nayê ber guh. Şûna dengê «**r**» dengê «**y**» derdikeve... («**herê**» dibe «**heyê**»). Lê belê, heke «**r**» di serê bêjeyê da be herwekî dengê xwe tête bi lêv kirin. Tenê di nîvek û dawîya bêjeyê da dibe «**y**».

Dengê «**h**» jî di devokê Hekarîya da ji devokên dî zêdetir bi kar têt: **herê**/**erê**, **rih**/**rî**, **bêhn**/**bîn**, **têhnî**/**tî**, **mih**/**mî**, **bahr**/**par**, **xwahr**/**xwar**, **pahtin**/**patin**, **kahnî**/**kanî**, **rêhl**/**rêl**, **heyv**/**hîv**, **sihwane**/**sîwane**, **mêhvan**/**mêvan** û gelekên din.

Ji alîyê gramerê ve devokê Hekarîya

Devokê Hekarîya ji alîyê qayde û formên gramatîkî ve hindek taybetîyên xweser hene... Lê belê, ev cûdahîye ne bingehîn in, formel in. Wekî dî ev devoke bi timamî li gorî çarçova gramera ku Bedir Xanîyan danî bi kar têt...

Nuansên ku ji devokên dî cûda têne gotin formên piranî, çend daçek û lêker in.

Mînak: «Gundî**yêt** Hekarîya, dar**a** ji rêhl**ed** dûr tînin». Ev hevoke li gorî forma piranîya ku Bedir Xanîya danî divê ku wisa be: ««Gundîy**ên** Hekarîyan, dar**an** ji rêhl**en** dûr tînin». Ev forme digel Hekarîya li Behdîna, Botan û li nav hin Kurdên Qafqasyayê jî bi kar têt... «Ji kerb**êt** wi ew hingizî...» — «Ji kerb**ên** wî ew hingizî»...

Forma nêr û mê jî di devokê Hekarîya da cûdahîyek heye: Bo yekanî **ê**, **a** û bo piranî jî **ên** û **an** bi kar tên. Lê belê, di gel van forma bo cinsên nêr û mê, «**ê**» jî bi hev ra bi kar têt...Helbet di halê nexûyayî da ev forme têtê dîtin...

Mînak: «Em bi rê ve rastî gundiyek**ê** hatin...». Li vê derê cins nexûya ye. Dibe ku ew gundî mêr an jî jin be... Lê belê, li gorî gramera Bedir Xanîyan divê heke ew gundî mêr be wekî «gundiyekî» bi kar bêt. Heke jin be, dibe «gundiyekê»...

Ev forma ku ji bo herdu cinsan di devokê Hekarîya de wekî «**ê**» bi kar têt, di halê nexûyayî de formeke rast e... Ji ber ku ev form ji bo cinsê mêr î nexûyayi jî bi kar têt. Mînak: «Ez bi rê ve rastî mêrikek**ê** hatim, min nas nekir»... Dema ji bo cinsê mê jî be wisa têtê gotin: «Ez rastî jinek**ê** hatim...».

Dema halê xûyayi bi kar têt heke xasyetek (rengdêr) bi dûv ra gotin; du form bi kar tên:

1°«Ez rastî mêrikek**î** reşesmer hatim...» An jî «Ez rastî jinek**e** delal hatim...».

2° Hesp**ê** boz, nan**ê** hişk, goşt**ê** sor...

Heke nav li dûv nav bêt:

Hesp**ê** Soro, nan**ê** tenûr**ê**, goşt**ê** golikan... Heke pronov li dûv nav bêt: Hespê min, nanê te, goştê wi... Heke cins û hal xûyayî be, ji bo mêr şuna «**î**», «**i**» bi kar têt...

Mînak: «Ez çûm aş**i**», «Kê got ? W**i** morov**i** got», «Nanê şivan**i**»...
Ne ku aş**î**, morov**î**, şivan**î**... Lê belê heke di halê xûyayî û yekanî da be «**î**» bi kar têt.

Mînak: Hespek**î** boz, darek**î** stûr...

Ji bo cinsê mê: Mahînek**e** kihêl, şevek**e** sar, darek**e** mezin... Ne ku mahînek**a**, şevek**a**, an jî darek**a**...

Li vê derê divê bête gotin ku; «**i**» an jî «**î**» di devokê Hekarîya da, herweha forma tewandinê ye. Di hin devoka da ev forma deklinasyonê wekî «**ê**» bi kar têt.

Mînak: **aş** dibe **êş**, **xanî** / **xênî**, **ziman** / **zimên**... Lê belê di devokê Hekarîya da ev nimûne wisa dibin: **aşi**/**aşî**, **xanîyî** wek xwe dimîne, **zimani**/**zimanî**... Heke di hevokekê da bête gotin: «Ez çûm **êş**» di devokê Hekarîya da dibe: «Ez çûm **aşi** / **aşî**...».
Dîsa di forma piranî da gelek cara şûna an tenê a bi kar têt.

Mînak: «Min refeke kew**a** dit»... Ne ku «kew**an**»...
Binav kirina forma nêr û mê di hindek cinsên heywana da jî li Hekarîya cûda tête gotin. Wekî: **mêkew** ne kewa mê, **maker** ne kera mê, **mahîn** ne hespa mê...
Li alîyê dî; gelek bêje li Hakarîya nêr in lê li alîyên dî wekî mê bi kar tên...

Mînak: qelem**ê** min / ne qelem**a** min... Anjî devok**ê** Hekarîya / ne devok**a** Hekarîya...

Paşpirtika **-ina** jî li Hekarîya bi kar nayê... Şûna ku bêjin «Ez hespin**a** dibînim», «ez **hinek** an jî **hindek** / **çendek** hespan dibînim» tête gotin...

Daçek

Di devokê Hekariya da bi kar anîna daçekan jî piçeke cûda ye. Mînak: Heke daçeka pêşiyê «**ji**» be daçeka paşîyê dibe «**ra**» û «**ve**»... Wekî «**ji wi** / **te ra**» û «**ji îro pê ve**»... Heke daçeka pêşiyê «**di**» be daçeka paşîyê dibe «**da**»... Wekî «**di** nav gund **da**»...
Ne ku «**ji wî** / **te re**», «**di** nav gund **de**»...

Hin mînakên dî; **pêk ve**, **vêk ra**, **jê ra**, **tê da**, **pê ra**... Ne ku; **vêk re**, **jê re**, **tê de**, **pê re**...

Hejmartin

Di hejmartinê da li şûna «**yek**» «**êk**», li şûna «**dido**» «**du**», li şûna «**sisê**» «**sê**» li şûna «**sî**» «**sih**», li şûna «**not**» jî «**nehwêt**» tête gotin... Hejmarên di, kêm zêde wekî devokên dî têne gotin...

Hindek bêje û navên taybetî

Li Hekarîya şûna ku bêjin: «were **cem** min», «were **nik** min» tête gotin. Nimûnên dî jî wisa... **nik** / cem, **şibî** / nola; mîna, **dûv** / pey, we, wa, hosa, wesa, **weto** / welê, wilo, wisa, **çiku** / çunkî, **pitir** / bêtir, pirtir, **gelek** / pir, **evro** / îro, **duhî** / diho, duh..
lebê / çi, **belê** / erê, arê, **an** / yan, **heke** / eger, **harîkar** / arîkar, alîkar, **rûs** / tazî, **tezî** / sar, **ter** / şil.

Ji bo «**bav**» «**bab**», ji bo «**dê**» jî, «**da**, **dadê**, **dayê**, **dîyê**» tête gotin...

Poz di devokê Hekarîya da mana «**qûnê**» dide. Lê belê bêjeya hevmana **bêvil** an jî pozê **kepî** an jî **difin** e...

Partîkel

Şûna «**ê**», «**a**», **ên** / **yê**, **ya** û **yên** bi kar tên... Mînak: **yê** mayî, **ya** revî, **yên** girtî...

Pronav

Bi giştî ji alîyê bingehîn ve, di devokê Hekarya da pronav nayên guhartin:

1° ez, tu ew em, hun ew.

2° min, te, wî / wê, me, we (hewe), wan...

Lê belê, di grûba duwemîn ya pronavan da; kesê yekemînê yekanî şûna «min» «mi» tête gotin... Yê sêyemîn ji bo nêr jî; «**wî**» di devokê Hekarîya da dibe «**wi**»... Mînak: Ez wi dibînim... «Ez li hespi siwar bûm»... Şûna «**wan**» jî «**ewan**» bi kar têt gelek caran... Şûna «**wan got**» «**ewan got**» tête gotin... Lê belê, ev pronavên sêyemîn, nêr û mê bi hev a «**wî**» û «**wê**» di axivtinê da dîsa form diguhurin. Mînak: şûna «**wî got**», «**ewi got**» an jî «**ewê got**» tête gotin...

Li alîyê dî, pronavê «**we**» jî li hêla Hekarîya wekî «**hewe**» bi kar têt. Lê belê, ev forme taybetî li şûna pronavê qedir girtinê bi kar têt ku di hindek zimanên evrûpîyan da jî ev forme heye.

Di rêzgirtinê da şûna «**we**» hem di yekanî hem jî di piranî da «**hewe**» tête gotin... Ev forme ji ber siyanet û qedir girtinê wisa bi kar têt...

Şûna ku bêjin «**we got**» dibêjin «**hewe got**»... Li hin alîyên Hekarîya wekî Şemdîna, şûna «**we** - **Hewe**», «**hingû**» anjî «**hingo**» jî dibêjin...
Pronavê refleksî «**xwe**», li hind cihên Hekarîya wekî «**xo**» bi kar têt. Lê bi piranî dîsa wekî «**xwe**» tête gotin...

Lêker

Di hevmanayî, bilêvkirin û kêşana hindek lêkeran da formeke taybetî heye di devokê Hekarîya da.

Mînak: Şûna «**anîn**», «**înan**» tête gotin. Nimûnên dî jî herwisa...
dadan / veniştin, **sotin** / şewitîn, **axiftin** / peyivîn, **alîstin** / alastin, **hinartin** / şandin, **şkandin** / şkênandin, **hisûn** / sûn, **hinûn** / dûn, **pejinandin** / kezixandin, **bişavtin** / bivaştin, **nivisti**/ razan, **jenîn** / jentin, **malîn** / maliştin, **hêlan** / hiştin, **terikîn** / zayîna kitik (pisîk) û seyan, **hûbûn** / hînbûn...

Di kêşana lêkeran li halê «xwezî»yê da jî formeke xweser bi kar têt:
Ez **mabame** / bimama

Ez **çûbame** / biçiwama
Ez **bame** / biwama
Ez **hebame** / hebiwama

Şûna «**ez biketima**», «**ez ketibam**» tête gotin...
Lezgîn dê **ketiba** / biketa, dê **bezîba** / bibezîya, **ew dê ketiba** / wê biketa...
Di kêşana lêkeran da, bi hevkarîya daçeka «**bi**» formên nû çêdibin. Ji ber vê çendê; bi hevkarîya daçeka «**bi**» lêkera «**bûn**» formên cûda werdigre... Lewma, şûna «**bû bûm**» di devokê Hekarîya da «**bibûm**» tête gotin.

Ez **bibûm** / bû bûm
Tu **bibûyî** / bû bûyî
Ew **bibû** / bû bû
Em **bibûn** / bû bûn
Hûn **bibûn** / bû bûn
Ew **bibûn** / bû bûn

(Di demên grûba duyemîna lêkara «**bûn**» da).
Çend formên guhartî yên lêkera: Mînak; «**bikim**» wekî «**bikem**» tête gotin: Nimûnên dî jî herwisa...
biket / bike
naket / nake
nasojit / nasoje, naşewitîne
ketne / ketine
kirme / kirime
bibitin / bibe

Lêkera «**nêrîn**» jî di devokê Hekarîya da bi çend rengan tête gotin:
Li Colemêrg, Elkî, Şax, Qesrik û piranîya Elbakê: **berê xwe dan** (berê xwe bide, berê xwe de)
Li Çelê: **berê xwe dan, zên dan û nêrîn** (berê xwe bide, berê xwe de, zên de, binêre)
Li nav Goyan: **hêre kirin** (hêre bikê, hêre ke)
Li Gever, Oremar û Çelê: **zên dan** (zên de)
Li hind alîyên Elbakê: **mêze kirin** (mêze bike, mêze ke)
Li Şemdîna: **berê xwe dan, berêxo dan** (berê xwe bide, bere xwe de, berê xo bide, berê xo de)

Forma lêkera «**nas kirin**» jî di devokê Hekarîya da tête guhartin û dibe «**niyasîn**».
Şûna; «**ez nas dikim**», «**ez dinyasim**» dibêjin.
Forma negatîv jî : «**ez nanyasim**» e.
Lêkera «**hînbûn**» jî di devokê Hekarîya da wisa bi kar têt: «**Hûbûn, hûrebûn**»...

Di devokê Hekarîya da lêkera «bûn» :

Demê niha: Ez im, **tu yî**, ew e, em in, hûn in, ew in.
Forma neyînî (negatîv): Ne ez im, ne **tu yî**, ne ew e, ne em in, ne hûn in, ne ew in.
Borîya berdest: Ez bûm, **tu bûy**, ew bû, em bûn, hûn bûn, ew bûn. (Ev forme li başûra Hekarîya û li dorberê Amêdîyê wisa bi kar têt: Ez bîm, tu bî, ew bî, em bî, hûn bîn, ew bîn...
Forma negatîv: Ne ez bûm û herwisa pê da diçe...
Borîya dudar: Ez bûme, **tu bûyî**, ew bûye, em bûne, hûn bûne, ew bûne.
Forma negatîv: Ez ne bûme û hwd...
Borîya çirokî: Ez bibûm, tu bibûy, ew bibû, em bibûn, ew bibûn.
Forma negatîv: Daçeka «**ne**» tête pêş û wisa dom dike...
Raweya gerane (xwezîyê): Ez bam, tu bay, ew ba, em ban, hûn ban, ew ban.
Forma negatîv: Daçeka «**ne**» tête pêş û wisa dom dike...

1° Raweya Bilanî; (Di forma yekemîn ya demê niha da): ez bibim, tu bibî, **ew bibît** / **bibit**, em bibin, hûn bibin, ew bibin.

Forma negatîv: Daçeka «**ne**» tête pêş û wisa dom dike...

2° Raweya Bilanî: (Di forma duyemîn ya demê niha da): Li vê derê hokerê «**heke**» an jî «**ku**» tête serî: Heke (ku) ez bim, heke (ku) tu bî, heke (ku) ew be, heke (ku) em bin, heke (ku) hûn bin, heke (ku) ew bin....

1°Borîya Berdest: Ez bam, tu bay, ew ba, em ban, ew ban.

Forma negatîv: Daçeka «**ne**» tête pêş û wisa dom dike...

2° Borîya Berdest: Ez bibam, tu bibay, ew biba, em biban, hûn biban, ew biban.

Forma negatîv: Daçeka «**ne**» tête pêş û wisa dom dike...

3° Borîya Berdest: Ez bibame, tu bibayî, ew bibaye, em bibane, hûn bibane, ew bibane.
Forma negatîv: Daçeka «**ne**» tête pêş û wisa dom dike...
Raweya Fermanî: Erînî; be, bin, bin / Neyînî; ne be, ne bin, ne bin.

Masdar :**Bûn** / Ne bûn
Mazî: **Bibûn** / Ne bibûn

Raweya Pîşkerî: (Demê niha): Ez dibim, tu dibî, **ew dibît**, em dibin, hûn dibin, ew dibin.
Forma negatîv: Ez na bim, tu na bî, ew na bît, em na bin, hûn na bin, ew na bin.

Borîya Berdest:

1° Ez dibim, tu dibîy, ew dibît, em dibin, hûn dibin, ew dibin.

2° Ez dibime, tu dibîye, ew dibîte, em dibîne, hûn dibîne, ew dibîne.
Forma negatîv: Daçeka «**ne**» tête pêş û wisa dom dike...

Lêkera **vîn** (vîyan) di halê demê niha da 1° Ez divêm, tu divêy, ew divêt, em divên, hûn divên, ew divên. 2° Min divêt, **wi** / **wî** / **wê** (ewi, ewi, ewê) divêt, me divêt, we (Hewe) divêt, wan (ewan) divêt.

Forma negatîv: 1° Ez nevêm, tu nevêy, ew nevêt, em nevên, hûn nevên, ew nevên. 2° Min nevêt, te nevêt, **wi** / **wî** / **wê** (ewi, ewî, ewê) nevêt, me nevêt, we (hewe) nevêt, wan (ewan) nevêt.

Lihevîya lêker: Li devokê Hekarîya; di hevokê da kirde û lêker li hev tên. Heke kirde piranî be, hingê lêker bi forma piranî tête gotin: Heke serve piranî be hingê kêşan (deklinasyon) tayîn dike.

Mînak: **Biçûk dibezin** / Zaro dibezin (Li vê derê biçûk pir in, lê belê piranîya wan bi forma piranîya lêker tête kivş kirin. Heke bêjin «**Biçûkan dibezin**» nabe). **Biçûk sêva dixwin** / Zaro sêvan

dixwin. **Biçûk sêva dixwe** / Zaro sêvan dixwe. **Biçûka sêv xwarin** / Zaroyan sêv xwarin. **Biçûk çend sêva dixwin** / Zaro sêvinan dixwin. **Biçûka çend sêv xwarin** / Zaroyan sêvin xwarin. (Li Hekarîya ji bo zarok : biçûk tête gotin)...

Li hind navçên rojava Kurdistanê carina hem kirde hem jî serve bi forma piranî, lê belê lêker bi forma yêkanî tête gotin: Wekî; Zaroyan sêvan xwar. Me sêvan xwar. Helbet ev forme şaş e.

Ketina tîp û kurtbûna bêjeyan

Helbet wekî hemû ziman an jî devokan, di devokê Hekarîya da jî kurtbûna bêjeya û ketina tîpa ji bêjeyê gelek tête dîtin.... Çend mînak: **paleyê jîr** / palê jîr, **perdeya sor** / perda sor, **malxwêyekî baş** / malxwêkî baş, **mezintir** / meztir, **zaravayê kurmancî** / zaravê kurmancî...

Di devokê Hekarîya da daçekên pêşi û paşîyê di axivtinê da bi kirde an jî bêjeyê ve dizeliqin. Ev ji ber bi lêz axivtina devoki ye... Mînak : **j'mi ra** (ji min ra), **ne'j bo** (ne ji bo), **ew'j** (ew jî), **Xanî'j** (Xanî jî), **ne'j** (ne ji), **cefa'j** (cefa jî)...

Ewi **b'tenê** nehêlin. (bi tenê)
Hûn hemû cilkên xwe **l'xwe** kin. (cilikên xwe li xwe bikin)
Eve **j'we** çetire. (ji we).

Hokerên cih nîşandanê

«**Kû derê**» di devoke Hekarîya da wekî «**kî derê**», «**kerdi**», «**kîrê**» bi kar têt.
Di hevokê da wisa ye: tu dê çîye «**kerdi**, **kîrê**» anjî «**kî derê**» ? / tu ji «**kîrê**, **kerdi**» anji «**kî derê yî**» ? / tu li «**kerdi**, **kîrê**» anjî li «**kî derê**» rûdinî ?

Çend bêje ji hêla Hekarîya

berze : winda
biçûk : zarok
birsî : birçî
bizdandin : qetandin, tirsandin
cindî : bedew
çu : tu / «Sohtim gelo çu di min nema»...
çûçik : çivîk
dêrhetav : tîrhetav, tîrêjên rojê
ezman : ziman
fekirin : nêrîn
gêsûbelav : kezîbelav
hêj : hê
hevişandin : hevşi kirina pez
hişyar : şiyar
înan : anîn
kab : şilît, şerît
kelebab : dîk, dîkil
law : xort, ciwan
leyzbaz : hîlekar
mencel : qazana mezin, sîtil
mindal : zarok
neşêm : nikarim (şiyan: karîn)
nik : cem
şol : kar, şixul
şubî/şibî : wekî, mîna
pêkve : bi hev ra
perû : xelat
pirçikokek : hindikek
ramûstin : maç kirin
rewal : xort
rohndik : hêsir
seh kirin : guhdarî kirin, bihîstin
sêhl : sêl
sotin : şewitîn
têk : bi hev, di yek
tûkil : kevilk, tûvilk
werîn / werandin : weşîn / weşandin
xalî : vala
zênda : lê nêrî

Hinek metelok û gotinên pêşiya ji hêla Hekarîya

Axa li keyfê ye, mal li bin befrê ye.

Berê darê, darê dixemilînît.

Berê gotina xwe bipêje, paşê birêje.

Bixwe şibî mêra, rabe şibî şêra.

Direwîn, carekê dixwe firavîn

Dilê şivan bixwazît, mastî ji nêrî çêdikit.

Ez axa, tu axa, kî golika bibe nav baxa.

Ewrêt reş baran e, ewrêt spî zivistan e.

Hesp suwarê xwe dinyasît.

Xwastin rûreşiyek bît, nedan ducara rûreşi ye.

Jin heye jinkok heye, mêr heye mêrkok heye.

Kuştin heye, reva mêra nîn e.

Kirmê darê ne ji darê bît, zewala darê nabît.

Keda helal, heram nabît.

Kî diket, kî dixwet...

Av ji serûkahnîyê şêlû dibît.

Av bi evrazi naçît.

Bi kevçikî kom kir, bi heskûyê belav kir.

Bira bira ye, bazar cûda ye.

Dengê daholê ji dûr ve'y xweş e.

Destê xwarinê'y dirêj e.

Mirovê nezan, aqilê wî ji kîsê xelkê ye.

Xweş xeber e, lê min ne bawer e.

Suwarê hespê xelkê, herî peya ye.

Zik têr e, çav birsî ye.

Asin sar naçemhît.

Ber li cihê xwe'y giran e.

Çiya bi çiya nakevin, çav bi çava dikevin.

Dîwarê ser befrê ye.

Gêsnê di çavê xwe da nabînît, derzîya di çavê hevalê xwe da dibînît.

Heke ecela bizine hat, nanê şivanî dixwet.

Heke agir berbû dehli, ter û hişt pêk ve disujin.

Her pezek û pêpka xwe.

Hîndî xwe be.

Heta mirinê kirin e.

Her evrazekê, nişîvyek heye.

Heta li ser serê xwe bi rêve neçî, qedrê pîya nizanî.

Xûdanê mirî'y kore ye.

Kero nemire heta kîvar şîn dibin.

Mala direwîni sot, kesê jê bawer nekir.

Her dar li ser binê xwe şîn dibît.

Tifa ser evraz e.

Zikê têr, haj yê birsî nîn e.

Têbînî:

— Ji bo parastin û berpêşkirina taybetmendiyên devoka kurmanciya Hekariyan, çu guhartinek di vê nivîsarê de nehatiye kirin.

— Peyva «devok» di zaravayê kurmancî de mê ye. Lê li ba hin Kurmancan ew dibe nêr.

F e r h e n g o k a

Mewlûda Bateyî

Amadekar : Zeynelabidîn ZINAR

kurdî	*tirkî*	*fransîzî*	*îngilîzî*
ala	bayrak	drapeau, étendard	flag, standard
avûrû / avrû	haya, ar, haysiyet, onur, itibar	vergogne	shame, bashfulness
ayîsîn	tutuşmak, yanmak	brûler	to burn, to be on fire
ayîsandin	tutuşturmak, yakmak	mettre le feu	to set on fire
babet	uygun, layık, deng	convenable, digne	fit, suitable, proper
berze, bizir, winda	kayıp	perdu	lost
berze bûn	kaybolmak	être perdu	to be lost
berze kirin	kaybetmek	perdre	to loose
buxûr	buhur	encens	incense
cergebez	kadın-erkek kolkola girilerek çekilen halay	une sorte de ronde mixte	a mixed folk dance
çavîn, çavînî	nazar	mauvais œil	evil eye
çavîn kirin, çavînî kirin	nazar etmek	porter malheur	to cause illness or misfortune by the evil eye
çu, çi, tu	hiç	rien	nothing, no, none
dîdar, dîtin	görüşme, görme, ziyaret	entrevue, visite	meeting, visit
kînedûz, kînedoz, kîndar	kin güden, kinli	rancunier	vindictive, rancorous
revd, rivd	gurup	groupe	group, set
seywan, sîwan	şemsiye	parapluie	umbrella
şepal	zarif	élégant	elegant, graceful
têwerhatin	sarmak, etrafını sarmak, sarıp sarmalamak, kaplamak	encercler	to surround, to coat, to cover, to encircle
verêtin	akmak (su vb)	couler (eau)	to run, to flow (water)
weryan, werîn, weşîn	dökülmek (saç, yaprak vb)	tomber (feuilles, cheveux)	to fall (hair, leaves)
westîn, rawestîn, sekinîn	durmak, kalmak	rester, stopper	to stay, to remains
reşbelek	metin, yazı	texte, écrit	text, writing

F e r h e n g o k a

Nehc-ul Enama Mele Xelîlê Sêrtî

Amadekar : Zeynelabidîn ZINAR

kurdî	*tirkî*	*fransîzî*	*îngilîzî*
bera	sahi, sahiden	vrai, vraiement	right
duezmanî	iki yüzlülük	hypocrisie	hypocrisy
dibac	ipek elbise	vêtement en soie	silk cloth
dujîn: çêr, dijûn, zêf	küfür	injure, insulte	insult
peşîwa	rehber, öncü	guide	guide
sezawar	layık, müstahak	qui est digne de, méritant	who merits
vebuhtin, vebuhandin	tayin etmek	nommer, désigner	to appoint, to nominate
reha bûn	kurtulmak	être libéré, être sauvé	to be freed

F e r h e n g o k a

Zargotina Kurdên Sûriyê

-II-

(ji sitrana «*Mîr Mendelî û Gulistan*»)

Amadekar : Mahmûd LEWENDÎ

kurdî	*tirkî*	*fransîzî*	*îngilîzî*
‘era, ‘erên	buruna takılan yüzük biçimindeki hızma	ornement en forme d’anneau porté sur le nez	nose-ring
berdevk	sigara, pipo ağızlığı, nargilenin ağıza konan kısmı	embouchure d’une pipe ou fume-cigarette	mouth-piece of a pipe, cigarette holder
biwar	mukabil, ön	devant, face	in front of
cixsî	silahçı dükkanı	armurier	armourer
çerxî	beş kuruşluk Osmanlı parası	pièce ottomane de 5 piastres	a 5-piastre piece
çox, çux	çuha	toile en poils de chèvre	goat-hair cloth
deqandin	tık tık vurmak	tapoter	drum one's fingers
deskêşî xwe kirin	yedeğinde götürmek	conduire un cheval de réserve au côté du sien	lead a spare horse
fit/fît	bitirme, fit	épuisement, achèvement	exhaustion, completion
goştbirinc	etli pirinç pilavı	sauté de viande au riz	stewed meat and rice
gulêrî	güllü	à décor floral	a floral decoration
helîmok	Kürt müziğinde makam türü	un mode musical kurde	a Kurdish musical mode
heşandin	doldurmak, dolgu yapmak	remplir, bourrer	fill, stuff
kepisandin	kapamak, sıkıştırmak, yerleştirmek	mettre en place, fixer	put in place, position
kevî	kenar	bord	edge
kit	tek	impair	odd
kito kito	teke tek	un à un	one by one
kuram, pismam, kurmam	amca oğlu	cousin paternel	cousin (of father's side)
kurdanî	Kürt usülü, Kürtçe	à la kurde	Kurdish style
kutilk, kutlik, kuftik	içli köfte	boulette de gruau à la viande haché	meat ball with groats
lev û lev	dopdolu	rempli à bord	full to the brim
mehîna boze sîse sayî/çîl sipî	lekeziz at	cheval à robe blanche	white horse
menegî	yarış kısrağı	jument de course	racing mare
naşî kirin, şanî kirin, şanî dan	göstermek	montrer, désigner	show, indicate
pala xwe dan	yaslanmak	s’adosser	lean back
paldan	yaslanmak, itmek, yatmak	s’adosser, s’allonger	lean back, lie down
payîzok	Kürt müziğinde makam türü	chanson d’automne, genre musical kurde	autumn song; a type of Kurdish music
qaqim	kelle, baş	crâne	head
qelandin	kavurmak	frire	to fry
qerepîn	karabin tüfek	carabine	carbine, gun

qeyserî	kapalı çarşı	marché couvert	covered market
qoq	kelle, baş	crâne	head
quraftin	demir, ağaç, plastik v.b. sert şeyleri bükerek kırmak, devşirmek	rompre, briser	to break
raser	üzeri, üzerinde	sur, au-dessus	on, on top
rav hilanîn	hayvan izi sürmek	suivre la trace d'une bête	tracking an animal
rav	paralel çizgi	lignes parallèles	parallel lines
rav	toplu av, saf kurarak avlanmak	chasse collective	a hunt
ravravî	paralel çizgili kumaş v.s.	tissu à rayures parallèles	cloth with a pattern of parallel lines
silav vedan	selamını almak	répondre au salut de qqn.	replying to a greeting
sitî	hanım, bayan	dame	lady
teqilandin	tartmak, ölçüp biçmek	jauger, peser	to measure, to weigh
turkanî	Türk usülü, Türkçe	à la turque	Turkish style
xizêmok	Kürt müziğinde makam türü	un genre musical kurde	a type of Kurdish music
xwînî	kan davalı, katil	assassin	assassin, murderer
Yezîrgan	Erzincan	la ville d'Erzincan	the town of Erzincan
zîz	ince, nazik	tendre, sensible	tender, sensitive

ZEWAC

Amadekar : Lutfî BAKSI

kurdî	*tirkî*	*fransîzî*	*îngilîzî*
zewicîn	evlenmek	se marier	to marry, to get married
zewicandin	evlendirmek	marier	to arrange a marriage
zewac	evlilik	mariage	marriage
şû kirin, mêr kirin, çûn mêr	evlenmek (kadın için)	prendre époux	to take a husband
jin anîn	evlenmek (erkek için)	prendre épouse	to take a wife
bi serî kirin/bûn, bi mal kirin/ bûn	evlendirmek / evlenmek	marier	to marry, to arrange a marriage
serî girêdan	başını bağlamak (evlendirmek)	marier	to arrange a marriage
di (bin) çav re kirin	gözüne kestirmek	avoir des vues sur qn.	to have one's eye on someone
geryan, lê gerîn, çav lê gerandin	gözücüye çıkmak	se mettre à la recherche d'une fiancée	to start looking for a bride
keçdîtin, dîtin, çûn dîtiniyê	1) kız bulmak (gelin adayı), görmek 2) görücüye gitmek	chercher une fiancée	to look for a bride
keçdîtin, dîtin, dîtinî	görücüye gitme	recherche d'une fiancée	looking for a bride
bi dilê... bûn / pê qayil bûn	benimsemek, razı olmak	consentir	to consent
herê / erêkirin	kız tarafının dünüre kız istemeye gelmeleri için olur vermesi	accord ou aval des parents de la fille pour donner sa main	agreement of a girl's parents for her marriage
çûn xwazgîniyê	kız istemeye gitmek, dünüre gitmek	aller demander une fille en mariage	to ask for a girl in marriage
xwazgînî, xwazgîn	kız istemeye giden kişi veya kişiler	ceux ou celles qui vont demander la main de la jeune fille	the match-makers
qasid	elçi	ambassadeur	ambassador

qelen, next	başlık	dot payée aux parents de la fille	dowry (paid to the girl's parents)
qelen birîn / qelen vebirîn, next vebirîn	başlık kesmek	décider du montant de la dot	to agree on the amount of dowry
qelenbirîn, qelenvebirîn, nextvebirîn	başlık kesme	cérémonie de décision du montant de la dot	ceremony for agreeing on the amount of dowry
binkîs	hatır akçesi olarak başlıktan kız babası tarafından bağışlanan meblağ	remise sur la dot consentie par le père de la fille en honneur de qn.	reduction in dowry agreed by the girl's father in honour of someone
xwastî	sözlü	engagée	wooed
nîşanî	nişanlama, nişan, nişan töreni	fiançailles	engagement
nîşan kirin, nîşan pê ve kirin	nişanlamak	acte de fiancer	the act of betrothing
şerbet, şîrînî	şerbet merasimi	cocktail offert pour célébrer l'engagement	cocktail to celebrate the engagement
destgirtî, dergîstî	nişanlı	fiancé(e)	fiancée
dest girtin	nişanlamak	fiancer	to betroth
sozdar, herêkirî	sözkesilmiş, sözlü	fiancé(e), promis(e)	betrothed
xelat, sernext	hediye	cadeau	present
şîrmijî, heqê şîr	süt bedeli (başlık kesilirken kız annesi için verilen meblağ veya hediye)	part de la dot payée à la mère de la fiancée comme «prix de l'allaitement»	part of dowry paid to the girl's mother for having breasted her
rê vekirin	nişanlı erkeğin nişanlılık döneminde kız evini ziyaret için hediye göndererek izin istemesi	cadeau envoyé par le fiancé pour obtenir la permission de rendre visite à la maison de la fiancée	present sent by the fiancé to obtain permission to visit his fiancée's home
rêvekirinî	nişanlı erkeğin nişanlılık döneminde nişanlısının ziyaretine ilişkin izin	permission obtenue par le fiancé pour rendre visite à la maison de la fiancée	permission given to the fiancé to visit his fiancée's home
cihêz danîn, karê bûkê kirin	çeyiz hazırlamak	préparer la dot de la mariée	preparing the bride's dowry
cihêz, kar	çeyiz	dot de la mariée	bride's dowry
çûna ser cihêz, dîtina cihêz	çeyizi görmeye gitmek	aller voir la dot	going to see the bride's dowry
xwençe, bişare, xelat	düğüne davet için gönderilen hediye	cadeau envoyé en guise d'invitation aux noces	present sent with invitation to the wedding
serşo	gelinin düğün için hamama götürülüp yıkanması	cérémonie de bain de la mariée	ceremony of the brides's bath
henne, xena, desthenne	kına; kına gecesi	cérémonie d'application de henné sur la main de la mariée	ceremony of staining the bride's hands with henna
vexwandî, xwandî, dawetî, gazîkirî, dawetvanî	düğün davetlisi	invité au mariage	wedding guest
xwandî	düğün davetlilerini çağıran	celui qui invite aux festivités de mariage	person who issues the invitation to the wedding
dawet, şahî	düğün	noces, fêtes de mariage	wedding festivities
serspî, porspî, serejin	düğün alayı öncesi gelin evine gönderilen haberci kadın	femme d'un certain âge envoyée chez la mariée pour annoncer le début du défilé nuptial	elderly woman sent to the bride to announce the begining of the wedding procession
rovî (berbûrî)	düğün alayı öncesi gelin evine gönderilen haberci erkek	homme chargé d'aller chercher la mariée chez ses parents	man responsible for fetching the bride from her home
berbûk, berbûdî	1) düğün esnasında geline refakat eden ve aynı zamanda	1) dame accompagnant la mariée pendant les	1) matron of honour (the bride's advisor

	ona danışmanlık yapan yaşlı kadın. 2) damadın evinde gelinin ilk duvağı açıldığında erkek çocuğu olması dileğiyle gelinin kucağına oturulan erkek çocuk.	festivités de mariage et lui servant de conseillère 2) garçonnet que l'on fait asseoir sur le genou de la mariée à son arrivée chez le marié avec le souhait qu'elle mette au monde un garçon	during the ceremonies) 2) small boy placed on the bride's knees upon her arrival at the bridegroom's home with the hope that she will bear a son
berbûkî	kadınlardan oluşan gelin alayı	défilé nuptial formé de femmes	wedding procession of women
berbûk	kadınlardan oluşan gelin alayına katılan kişi	femme ou fille partici-pant au défilé nuptial	a girl or woman taking part in the procession
birazava	sağdıç	garçon d'honneur	bride-groom
xêl, xêlî	düğün alayı	défilé nuptial	wedding procession
xêlî	duvak	voile de la mariée	bridal veil
bûk siwar kirin	gelini ata bindirmek	faire monter la mariée à cheval	mounting the bride on a horse
berderî	kapıbağı (kapı önü kesilerek alınan)	présent offert à celui qui se tient devant la porte d'entrée de la mariée au moment où on vient chercher celle-ci	present offered to the person at the door of the bride's home when she is fetched away
piştderî	kapı bağı (kapı ardı kesilerek alınan)	présent offert à celui qui se tient derrière la porte d'entrée de la chambre de la mariée au moment où on vient chercher celle-ci	present offered to the person standing behind the bride's home when she is feched away
hespkêş	gelin atının başını çeken	celui qui tient les rênes du cheval transportant la mariée	the person holding the bride's horse's reins
piştgirêdan	belbağı (gelin kardeşinin gelinin beline kemeri bağladığında aldığı hediye)	cadeau donné au frère de la mariée lorsqu'il met la ceinture autour de la taille de la mariée	present given to the bride's brother when he puts the girdle on the bride
sergirêdan	başbağı (gelin başını bağlayana verilen hediye)	cadeau offert à celui ou celle qui place la coiffe de la mariée	present given to the person who places the crown on the bride's head
sersindoq	gelin sandığının üzerine oturana verilen hediye	cadeau offert à celui ou celle qui est assis(e) sur le coffre de la mariée	present given to the person sitting on the bride's trunk
gîska 'ezepan	genç delikanlıların gelin alayının gelişinde yollarını keserek aldığı hediye	cadeau obtenu par les jeunes gens se mettant en travers de la route du défilé nuptial	present given to the young men barring the way of the procession
zengogirtin	atın üzengesini tutana verilen hediye	cadeau offert à celui qui tient l'étrier du cheval de la mariée	present given to the person holding the bride's stirrup
destgir	gelinin kolunu tutarak onu bindirmeye götüren veya damadın evi yakın olduğunda onu eve kadar götüren iki yakını	deux proches parents de la mariée qui la tiennent par le bras pour la faire monter à cheval ou l'ac-compagner chez le marié	two of the bride's close rela-tives who hold her arms to help her mount the horse or who accompany her to the bridegroom
mehr	nikah	acte de mariage	act of marrigage
mehr kirin	nikahlamak	marier	to marry
mehr birîn	nikah kıymak	célébrer un mariage	conclude a marriage
mehrbirîn	nikahkıyma	cérémonie de conclusion de mariage	celebrate the conclusion of a marriage
mehrbirr	nihak kıyan	celui qui conclut l'acte de mariage	official who concludes the marriage

mehrbirrî	nikahı kıyılmış (düğünü henüz yapılmamış)	personne officiellement mariée mais le mariage n'est pas encore fêté	person formally married but whose marriage festivities have not yet taken place
bermehr, bedelmehr	nikahta erkek tarafının kadının geleceği için vad ettiği güvence akçesi	somme promise par la famille du marié comme garantie d'avenir pour la mariée	amount of dowry personally guaranteed to the bride
mehr avêtin ser	nikahına geçirmek (biçimsel olarak yapılan nikahlama)	mariage formel, mariage blanc	'marriage' in name only, paper mariage
bûk	gelin	mariée, épousée	bride
zava	damat	marié, époux	bride-groom
serşoya zava/ê	gerdek için damat adayının yıkanma merasimi	cérémonie de bains du marié	ceremony of the bride-groom's bath
rûkurkirina zava/ê	damat traşı	cérémonie du rasage de la barbe du marié	ceremony of shaving the bride-goom
paşatiya zava/ê	gelinin damat evine gelmesi ile başlayan ve damadın gerdeğe girmesine kadar süren ve çevredeki bekarlardan oluşturduğu adamlarıyla sürdürdüğü beyliğidir	période de réjouissances incluse entre l'arrivée de la mariée et la nuit nuptiale, au cours de laquelle le marié accompagné de ses amis célibataires fête ses dernières heures de célibat	period of festivities between the conclusion of the marriage and its consommation during which the bride-groom spends with his bachelor friends his last hours of little lord
şabaş	1) duğünlerde damat için toplanan para v.s. bağışta bulunanların isimleri toplulukta söylenerek yapılan merasim. 2) düğünde çalgıcıların düğüne katılanlardan topladıkları bahşis	l) argent collecté au cours des festivités de mariage pour venir en aide au marié, 2) pourboire collecté par des musiciens qui nomment et font l'éloge de leurs bienfaiteurs	1) money collected during the marriage festivities to help the bridegroom 2) tips collected by the musicians for singing the praises of the guests
guhastin	gelinin damat evine getirilmesi	conduire la mariée chez le marié	leading the bride to the bride-groom's home
veguhastin	berdel halinde gelinlerin götürülmeleri	fête de mariage au cours de laquelle un frère et une sœur épousent une sœur et son frère	feast of of marriage, when a brother and sister are married to sister and brother
berdêlî, berdil, pêguhork	ailelerin karşılıklı olarak kızlarını birbirine gelin vermeleri, berdel	mariage croisé où un frère et une sœur épousent une sœur et un frère	double marriage between a brother and his sister with a sister and her brother
gerdek	zifaf, gerdek	chambre nuptiale	nuptial room
berdan	boşama, boşanma	divorce, répudiation	divorce, repudiation
berzewac, xame	evlilik çağına gelmiş kız veya erkek, ergen	fille ou garçon en âge de se marier	youth of marriageable age
kıtan lê şkestî	evlilik çağını aşmış genç kız	vieille fille	unmarried girl
zavayê navmalê	iç güveyi	gendre qui habite chez ses beaux-parents	son-in-law living in his wife's family
çûyîna sermalê	dul kadınla evlenen erkeğin kadının evine taşınması	épouser une veuve et s'installer chez elle	marry a widow and live in her house
hewî, hêwî	kuma	co-épouse	second wife
serhewiyê	kuma üstüne giden (evlenen)	mariage d'une femme avec un homme déjà marié	marriage of a woman with an already married man
jinebî, bîjin	dul kadın	veuve	widow
mêrebî	dul erkek	veuf	widower
keç revandin	kız kaçırmak	enlever une fille	to elope with a girl
revok	aynı kızı tekrar kaçıran erkek	homme qui enlève pour la deuxième fois la même fille	a man who elopes twice with the same girl

revandî	kaçırılan kız	fille enlevée	kidnapped girl
darika zava/ê	gelin alayını damda bekleyen damadın yanında süslenen özel hazırlanmış ardıç ağacı	arbre décoré auprès duquel le marié attend l'arrivée de la mariée	ornamented tree beside which the bridegroom awaits the bride's arrival
nemêr	iktidarsız (cinsi)	impuissant, impotent	impotent
nêremê, nêramê, nêrebûk	kız-oğlan, hünsa	hermaphrodite	hermaphrodite
koçek	köçek, çengi	danseur, danseuse	dancer

Ferhengoka
Yûsif û Zuleyxa

Amadekar : ELÎŞÊR

kurdî	*tirkî*	*fransîzî*	*îngilîzî*
hîn: dem, wext	an, vakit	moment	a while, moment
xewas	dalgıç	plongeur	diver
serpoş	1) başı örtülü, 2) başörtüsü	1) qui a la tête couverte, 2) couvre-chef	1) whose head is covered, 2) head gear
bi yekdan: bi carekê	birlikte, bir seferde	en une seule fois, ensemble	all at one, together
çar û naçar	ister istemez	volens nolens	willy-nilly
pencik: penç, pençe	pençe	griffe	paw, claw
zarî kirin; zarîn	inlemek, yalvarmak	gémir, supplier	to groan, to implore
bikirr	müşteri, alıcı	client	customer, client
balîn	başucu	chevet	bed (head), bedside
kax: qesr, koşk	saray, köşk	palais	palace
berzex	1) araf, 2) ince uzun kara parçası	1) purgatoire 2) isthme	1) purgatory 2) isthmus